

HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Giştî

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Drê Birahîm Mehmûd

Ebdilxaliq Sersam

Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Drê Mihemed Ezîz Zaza

Ferde Cemîl Paşa

Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Hecî Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

ÇEND BADEK LÎ SER MÊZA HÎKUMETA YEKGÎRTÎ	SERGOTAR	100
TAWANBARIYÊN LI DIJÎ MALBATA BARZANÎ Û CEZAKIRINA DR. KEMAL QADIR	FÛWAD SÎPAN (AKPINAR)	98
YEKÎTÎYA STATUKOPARÊZ	Remezan PERTEW	95
MEDYA Û BERNAMEVANÎ DÎKSIYON (Xweşaxaftin)	Deniz Dargul	93

Çewaniya Firotna Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mirî û Sendike (15000) Dinar
Kesan (12000) Dinar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mirî û Sendike (7500) Dinar
Kesan (6000) Dinar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo
Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgitin.net

www.hevgitin.net

ÇEND BADEK LÎ SER MÊZA HİKUMETA YEKGİRTÎ

Di dawî de û piştî gelek hewildanan ku bi salan dewam kirin her du partiyên sereke- Partî Dîmokratî Kurdistan û Yekîti Nîştîmanî Kurdistan-gihştine biriyarê jib u belan kirina posteyen wezarî û mekanîzma serokatîyê û ragihandina hikumeteke hevpişk û yekgrtî ku nav lê hate kirin rêvebiratiya hewlêr û silêmanî bo dema katî. Ev pêngave tê ji bo cî bi cî kirina lihevhatinê û xwe gihandina ramanên wekhev di derbarê dozên bingihî û îraqî û netewî kurdistanî û destûra îraqa federal û pêşeroja welat û bi taybetî hevpeyman li ser bernameya hevpeymanîya kurdistanê û hîlbijartinan li ser her du astan yê Îraqî û Kurdî ji berî rizgariya Îraqê, bê gomane jî ku peymanîya siyasî her wextî kelem û bi her awayekî buyera yekgirtinê derng dixist.

Misogeriya bi cih îmana vê serkeftinê û parastina wê û pêşve çûna wê vedigere bo bi dûv çûna perlemanê kurdistanê wekî desthilateke yasadananê û çavdêrî ta ku bendên wî yek bi yek bi cih werin û duvv çuna berdewam ji aliyê serokê herêma kurdistanê wekî desthilata yekem û cihê baweriyê ku ji hêla gel ve were hîlbijartin , di gel rola rola nûnerên hêzên fire regez di Îraqê de û bi taybet yên Amerîkî ku ji nêzik ve di sopînin û berî niha xwedan li peymanîya Waşntonê di nav bera her du partiyan de derketin,

em vê di bêjin ji metirsiya ku careke din ev buyer tûşî zehmetiyan û binkeftina were, weke ku di dema fiftî fiftî- nîn bi nîvî- çê bu û bus edema gelek li hevketnên diltezîn û ta niha bermayên wê mejiyan de mane.

Girîngiya vê destkeftinê ewe ku yekem hikumetkurdistanî yekgirtî ku piştî rizgar bûna îraqê ji dîktatoriyetê û di hindirê lezgîniya kiriyara siyasî û dîmokrasiya ku pêk tê û piştî li hev kirina netweî li ser destûrê nû û lidarketina hibijartinên giştî û di şeva damezirandina hikumeteke îraqî ku hemi netwe û leyenên Îraqî temsîl dike. ev yekgirtine piştî ku xelkên kurdistanê bi hemi şiyânên xwe dixwazin wan destkeftên ku di destûrî de bi cih bûne ji destê wan ne çin hatiye avêtin, û ew mafên ku di berjewndiya netewî, aborî, geşepêdan, dîmokratîk, mirovane û civakî.

Kesên çavdêr wisa bwer dikin ku yekgirtina hikumetê di wextekî guncaw de çê bû û di wextekî de ku mercên navxweyî, îraqî, herêmî û navnetewî û gelek delîvên mezin yên serkeftinê û bi dest xistina gelek tiştan. Her du partiyên desthilat karî bûn mercên parastin û pêdiviyên van desktkeftan biafrînin, eve çî girêdayî nûneratiya pêkhatiyên kurdistanê ya netewî yan xwedan şiyânên zanistî ku taybetî ku têne xwestin di mecên niha yên kurdistanê de, ji ber ku ev taybetmendî ewin yên ku serkeftina arkên hikumetê misoger dikin, ew hikumeta ku wê gelek doz û pirsgirêk li pêsiya wê hebin ji bû çareseriyê û ji wan evin:

Badekên (melefat) olekariyê, pirgirêkên xizmetgozarî, pêkanîna qanûnan, şerê gendeliya îdarî, çavdêriya civakî, xort kirina konetartên giştî û bi taybet yên pêşesazî û ji wan yên petrolî û yên ku girêdayine bi gelê herêmê ve yên hejar, xweş kirina mercên xwendinê bi her awayekî wê li ser bingihên zaniyarî û dîmokratî ku vekirî be û dor be ji hişkatiya olî û mezhebî, danan pêlanan jib o wergirtina derçûyên zanko û kulîjan, danana bernameki kar yê merkezî û yekgirtî ji bû geşepêdana çanda kurdî û gelek doz û manşetên din yên ku girîngin jib u keç û lawên kurdistanê û nifşên ku tên.

TAWANBARIYÊN LI DIJÎ MALBATA BARZANÎ Û CEZAKIRINA DR. KEMAL QADIR

FÛWAD SÎPAN (AKPINAR)

Van rojana di çapemeniya Kurdî de li ser 30 sal cezakirina Dr. Kemal Qadir gengeşiyeye mezin dest pêkiriyê û wisa xuya ye dê demekê jî raya Kurdistanê xerîk û meşxûl bike. Hin kes jî dizanin, belkî di jiyana xwe de du gotin jî nenivîsîne, xwe wek demokrat û mafparêz dibînin, îftira, derew, sixêf, dijûn û buxtanên Dr. Kemal Qadir li ser malbata Barzanî biçûk dibînin û wî diparêzin. Lê li aliyê din, çi dibe bila bibe, ne bi dilê me be jî baş e ku Kurd di nav xwe de hînî gengeşiyên wiha jî dibin û li ser bûyêrên wiha di çapemeniya xwe de diaxiftin, da ku gelê me, civata me jî pê bihase, ku hin caran neheqî, îftira û buxtanên hin kesan çiqas zerarê didin civata Kurdî, ku ji van bûyeran ders bêne derxistin. Ez bawer im di vê xalê de pirsgerêka herî girîng ew e, ku Dr. Kemal Qadir li Hewlêrê bi qanûn û biryarên, ku di dema Seddam Husêyîn de bi taybetî li dijî Kurdistan hatine derxistin, da ku bi cezakirinê dengê nivîskar û çapemeniya Kurdî bibire

hatiye girtin. Jixwe nerazîbûna Kurdistan li dijî cezakirina Dr. Kemal Qadir bi taybetî jî ev xal e. Divêt em hevdu nexapînin, kesên kêr zêde ji siyaseta û hiqûqê hinekî dizanin, dikarin bêyî ku li ser zêde serê xwe biêşînin navê vê biryarê wek biryareke siyasî bi nav bikin. Li aliyê din jî her kes dizane ku biryarên Seddam Husêyîn li dijî Kurdistan hemû jî biryarên siyî ne. Loma ne hewce ye ku mirov zêde li ser vê biryarê bisekine û bêje, gelo ev biryar siyî ye an na? Kî çi dibêje bila bibêje û kî jî ji bo berjewendiyên xwe yê şexsî çiqas rûndon dihelîne bila bihelîne, ev biryara 30 sal cezakirinê biryareke siyî ye. Ez bi xwe jî, bêyî ku vî mirovî qasî nîskeke biparêzim ji biryara 30 sal cezakirina wî gellek aciz bûm. Kêmasî an jî şaşiyên Kurdistanê Azad, hukumeta û hemû dezgehên di vir de ew e, ku ev nêzîkî 15 sal e parlamena xwe neşuxulandin û Kurdistanê Azad ji qanûn û biryarên Seddamê dîktator xalî nekirin.

Dadegehên Kurdistana Azad bi biryarên wiha ti xizmetê ji Kurdan re nakin, ew bi biryarên wiha leke tînin ser Kurdistana Azad û hacetan didin destê dijminên Kurdan. Loma bûyera cezakirina vî mirovî niha êdî ji pirsra navxweyî derketiye, bûye pirsgirêkeke navneteweyî. Cihê pirsê ye ku em bêjin: Gelo dadegeha Hewlêrê bi 30 sal cezakirina vî mirovî ji Kurdan re ji bilî xerabiyê di qada navneteweyî de çi qezenc kir? Bedelê îftira, derew, sixêf, dijûn, boxtan û hwd ji devê kesekî, ne 30 sal ceza ye. Bûyerên wiha bi derew û boxtanan li welatên demokrat bi cezayên peran û an jî bi îhtaran têne dayîn. Mirov li Ewropa du mirovên bê sûc û bê guneh jî bikuje dîsa 30 sal ceza nagire. Kurdistana Azad bi van bûyeran rola xwe di qada navneteweyî de xerab dike û ew qezencên ku heta niha bi ewqas bedel, ked û zahmet hatine qezençkirin, bi carekê ji holê radike. Pirsra girîng ew e, ku kî ji vî mirovî bawer dike û derew û boxtanên wî bi çend qurişan dikin?, û kî di vê babetê de wî diparêze?. Ez bawer dikim ti kurdek bi gotinên wî ne bawer e û ew li ber çavên pir kesan jî wek paranoya û aqilsivik tê hesabkirin. Dê cezayê herî mezin ji bo vî mirovî ew bûya, ku dadegeha Hewlêrê li ser pîskolojiya wî lêkolîn çêbikira û cezayê tedaviya pîskolojîk bida wî ku ewî jî êdî nikariba xwe, ne li Kurdistanê û ne jî di qada navneteweyî de bi derewên xwe,

xwe biparêze. Lê mixabin ku dadegeha Hewlêrê bi cezakirina 30 salî hacetên pir mezin dane destên wî, ew û malbata wî niha di qada navneteweyî de baş ji xwe re bi kar tînin. Ez bawer dikim, ku Dr. Kemal Qadir bi provakasyonên xwe, xwe gihand armanca xwe. Ewî di cîhanê de bi milyaran dolar pere bireşanda jî, dê nikaribûya ewqas reklama xwe çêbike. Lê sed hezar carî mixabin, ku siyaset û dadegeha Kurdistanê hatin provakasyona vî pîskopatî. Ê dîsa sed hezar carî mixabin, ku mirov di vê mijarê de jî dibîne, ku li Kurdistana Azad hê jî hesabên pir biçûk têne kirin. Ez pir pê diêsim ku bêjim, em Kurd hên jî hînî ramanên mezinbûnê nebûne.

Bê guman mirov dikare û divêt her welatparêzek xwe mafdar bibîne, ku rexneyan li hukumet û hemû dezgehên Kurdistanê bigire. Civata bê rexne civateke mirî ye, civata bê rexne, dibe civata Misto Kemalê Betonê Contirk, dibe civata Hîtler, civata Seddam Huseyîn û hwd. Ê divêt kesên xwedî qelem hin caran bi rexneyên xwe siyasetmedaran bihejinin jî. Lê divêt em tiştêkî baş bizanibin: Mafê ti kesî nîne, ku kesekî û malbata wî – kî dibe bila bibe – bi tawanbariyên bê bingeş sûcdar bikin. Divêt em bi rexneyên xwe rêzgirtinê ji bîr nekin, di sînorê mirovatîyê, realtê de bimînin, hestiyarên û hesasiyetên xwe her dem

bidin aliyekî û li gorî aqil û mantiq tevbigerin.

Lê divêt ev mirova jî baş bizanibe, ku ne ji mafê wî ye, ew wisa rasthatî şexsan û malbatan bi boxtanan tawanbar bike. Eger delîl û îspatên wî hene, divêt ew wan derîne holê. Na, eger tişteki tîne ye, mafê wî nîne, ku bi vî awayî kîna xwe li dijî malbata Barzanî birijîne. Eger hinekî şerm û rêzgirtina vî mirovî ji mirovatîyê re heba, dê ji malbata Barzanî re rêz û hurmet bigirta. Mirov dikare li ser şaşî û kêmasiyan bisekine, ne şerm e ku mirov rexneyan jî bike, lê şerm û fedî ye ku malbatek wek malbata Barzanî, ku bi şan, bi şeref û bi rûmet doza Kurdistanê li hemberî dijminan bi lehengî parastîye û bi hezaran şehîd li seranserê Kurdistanê dane bi çavsorî tawanbar bike. Eger hinekî bihna Kurdayetîyê, welatparêziyê ji vî mirovî bihata dê kêmtir ji şehîdên enfal fedî bikira.

Malbata Barzanî mohra xwe li Kurdistanê xistiye û Melle Mistefa Barzaniyê mezin mîlada Kurdî ye. Malbata Barzanî bi şehîd û lehengan ji bo me Kurdan li hemberî dijminan li ber xwe dan û em Kurd îro di cîhanê de bi perçeyekî azad xelat kirine. Dijminên Kurdan bi çar çavan li hêviya wê rojê

ne, ku bi derewan malbata Barzanî li ber çavên gelê Kurd reş bikin. Loma malbat Barzanî bûye dirik di çavên Farisên kevneperest, di çavên Erebên şovenîst û di çavên contirkên devrût de çikyaye. Çimkî birîna wan li ser malbata Barzanî kûr e. Çimkî malbata Barzanî ji bo rizgarkirina Kurdistanê derbên mezin li wan dane. Eger hêza dijminên Kurdan têr bikira dê di rojekê de malbata Barzanî di nav ava kevçiyekî de bixeniqandana. Qet nayê fêhm kirin, ku ev mirova bi çi mantiqî dijûn û sixêfan li malbata Barzanî dike û serokê Kurdistanê dike bin tawanbarîyan.

Niha di cih de ye ku bêye pirsîn, armanca vî mirovî çi ye? Ew dixweze ji van derewên xwe çi sûd û îstifadeyê bigire? An jî ew bi van boxtanan dixweze ji kê re xizmetê bike?

TIKA, RICA, DAXWAZ

Ez ji serokê xwe yê birêz serokê Kurdistanê, lawê Melle Mistefa Barzaniyê pîroz Mesûd Barzanî tika, rica û daxwaz dikim, ku bi lez û bez pêşî li vî gengeşiyê bigire, Dr. Kemal Qadirê bêxêr efû bike, ew mezinahiya xwe rayê her kesî bide û destûrê nede, ku careke din li Kurdistana Azad şasiyeke wiha dîrokî dubare bibe.

YEKÎTÎYA STATUKOPARÊZ

Remezan PERTEW

Amed

Bi rastî jî eger dê behsa nasnameyeke ewropî bête kirin divê mirov li pêvajoya peydabûna bîrewerîya nasnameya ewropî binere. Bi awayekî zelal dîyar e ku li vê nasnameyê de pitir ji rewşa cografî, helwesta sîyasî/ cîvakî dîyarkerê bîngêhîn e. Her weha wekî tê gotin, herçî veqetokên wekî şareza (Yewnan) – barbar (Enetolî), Katolik – Ortodoks, Xristiyan – Misulman, Katolik – Protestan, NATO- Pakta Varşova hwd. nin, ev hemû dîyardeyên sîyasî/cîvakî nin. Li tu qonaxên dîrokê de tu car ramanek hevpar çênebûye ku sînorên ewrope û ewropeyî li ku destpê dîke û li ku tewaw dibit. Em dikarin behsa qitayek(parzemînek) wisa bikin ku ev pitir legel peywendîyê heyamî/demî geh mezinbûye/piçûkbûye, geh tengbûye/firehbûye, geh pêşketîye/paşdemaye û geh jî pîrbûye/ciwanbûye. Herwiha mirov û civakên li ser vî cograyayê jî geh bûne ewropî û geh jî wekî ewropî nehatine hesabandin. Bi rastî piştî pêvajoya ronensansê û reforman ev rewş hê

pitir bûye pîrsgirêkek girîng. Herwiha legel keşfên cografî, mêtîngêhkirina welatan û dû re legel şoreşa sînaî civakên ewropî ji nûve şikilîn û xwe hê pitir bi awayekî sîyasî danasandin. Nemaze li ew rewşa alozîya serê sedsala 20 emîn de ku sînorên gelek dewletan ji nû ve dihate sazîkirin, ev danasînê xwe ên sîyasî bo civakên derveyî xwe ji bi kar ve anîne. Bo numûne sînorên niha yê wekî Lîbya-Misr, Îraq-Yurdûn-Erebîstanê hem bi cedwelê ve hatine kişandin û hem jî sînorên dî yê dewletên wekî dî jî bêyî dengêyên civakî/etnîkî û demografîkî hatine sazîkirin û bervacî vî bo demê pêşî zemînek nakokî û pevçûnî hatîye amadekirin.

Ma projeya yekkirina dewletên ewrope bi xwe jî ku tu caran pêk nehatîye, ne îfadeyeke helwesta sîyasî/cîvakî bixwe ye? Di vî manayê da otorîtetîrîn kes û sazîyan jî ma dikarin bo me perspektîfekî zelal bidine? Ew formulasyona ku "li derveyî xwe "yê dî"yek dabînasîne"+ "hin

xisûsîyetên wî bike aîdê xwe" + " bo xwe ahengdar bike" bawer im peydabûn û sînor û naveroka nasnameya ewropî bi awayekî baş îfade dike. Bes îstîsnayêke vê bêsinorî û guherîniyê parçeyê alî rojavaya ewrope ye ku bi tevahî fenomena ewrope/ewropeyî li wir de sabît û tecessum bûye. Bi rastî qesta ji yekitîya ewrope jî ew e ku aliyên dî yên ewrope yekser bêne ser norm û hêşengên rojava yê. Li gorî pêwîstîya xwe û kapasîteya xwe î hezmê û qabilîyeta guherînkariya xwe çêdibe ku herkes bibê "yê dî". Li gorî rojavayê ewrope ne dîyar e ku Xirwatek an Slovakek an Çekkek an Leh an Bulxarek an jî Macirek gelo ka ewropî ye an na? Lêbelê li gorî vanan (yên dî) guman nîne ku ewên li rojavayê ewrope nin resentiirîn ewropî nin. Belam ew li ser ewropîbûna Tirkek an Ermenîyek an jî Kurdek de bê dilê xwe ne û ewçend ne xwedî qerarekî erênî ne. Hingê yeganiyên rîya çareserkirina meseleyê ev e ku ew zîncira hêşengên cîhangîştî ku çavkanîya xwe ji qitayê digrine divê ew bêne derpêş kirin û aliyê wan ên ber bi cîhangîştî ve bête dîyarkirin. Ne ew hêşengên asîmîlekar divê sîyasetên hêşengên akomodekar bête teşwîq kirin. Ê legel peywendîya Rojava û Yê Dî de bi awayekî seranser hewldana pêşxistina bîrûbawerîya bi hevudû re divêye. Ez niha ne bawer im ku hêşengên ewropeyî ku rastîya wî bi xwe menqûl

e, nikare bo civakê dî û nemaze jî bo ew civakên ku ji rûyê wî di bin xeterê de ne bibê xwedî qîmetî herbîyeyek. Îroj Lî zîkê rohilata navîn de eger hêşta jî meseleya neteweya Kurdistanê çareser nebûye ev encamê sîyaseta dewletên ewrûpî yê serekeyên ku ew li hember mirovahîyê de tawanbar in û dîyar e dê di bin giraniya vê barî de bişikêne. Heman ewrope îro jî bi vî sîyaseta xwe î statukoparêz bo yekî Baskî an Korsîkayî ku di navenda wî de ne, an jî hê li dûrahîyan de bo yekî Sehrayê rojavayî an jî bo Kurdeke, bo Belucîyêke, bo Çaçaneke, bo Kaşmîrîyêke ji bilî maf û azadiyên ferdî ku ew ji ne pir durust in nikare tu mafê neteweyî/civakî wehd bike. Ber vî yekê ev netewe û civakînan jî ji bin xeterê rizgar nabin. Rastî ez ne bawer im ku tî dewletên serekeyên ewrope derdek wan î wisa heye. Bo çareserkirina buhrana ev weqîya ewrope û ewropeyî divê nûnerên wan awayê têgihîştina xwe ên cîhanê biguherînin. Çawa ku USA bi felsefa xwe î pragmatîzma antîstatukoparêzî bû hêza serekeya cîhanê divê ewrope jî xwe ji statukoparêzîya tund ve azad bike. Her wiha jêhatîbûn û dilxwazîya ewrope bo guherîna statukoya bêdengeyê global ku ew bi destê wî hatibû çêkirin wê dîyar bike ku gelo ew dê karibe gunehên xwe î berî pakij bike û deyn û barên xwe î mirovahîyê bide an na.

MEDYA Û BERNAMEVANÎ

DÎKSIYON (Xweşaxaftin)

Deniz Dargul

A-Di Bernamevaniyê de Dîksiyon û Girîngiya Wê:

Dîksiyon çi ye?: Dîksiyon, ew gotina dev e ku, mirov di ciyê xwe de cî bi cî bike. Xemilandina raman e ku, gotinên wê, di ciyê xwe de, pêk bîne. Tespîtkirina gotinên di ciyê xwe de ye. Şewazek avakirin, guhertin û pêşxistinê ye.

Arîstoteles : Ew gotin e ku, mirov di ciyê maqul û pêwîst de, bi lêv bike!

Çîçero : Fîzyonomiya Hizrê ye. Rêbaza bingeşin a hizirkirinê ye!

Gothe : Mirovek ka li gorî çi ye ango çi nîn e!

A.Firat : Xweşikiya bizav, ziman û cewhera jiyana mezin e!

Girîngiya dîksiyonê, ji bo hemû kesî derbas dibe. Mijarek gelek girîng e ku pêwîst e mirov ji her aliyan ve binirxîne. Her kesek xwediyê rêbazek axaftinê ye. Çi baş be, çi jî xirab be. Lê xweşaxaftin, mertebeya aqil û mezinbûna mirov a çandê destnîşan dike. Mirov bi xweşaxaftinê, ango nexweşaxaftinê hevdu fêmkirin û li

hemberî hev û din helwestên baş ango xirab datînin. Her mirovek dixwaze gotina xwe di cî de bibêje. Her mirovek ku dibêje ez mirov im, dixwaze ti kesî neêşîne. Ji ber ku dîksiyon gewdeya hizir û mezinahiya çanda mirov destnîşan dike. Hizir û baweriya sistematîk encax mirov dikare bi dîksiyoneke baş bide îfadekirin. Ka mirovek li gorî çi ye ango çi nîn e, kêrî çi tê ango çi nayê, mirov dikare bi gotinên ji devê wî derdikevin ve, bizanibe. Cewhera jiyana mirovan, xwe bi xweşik axaftinê ve, diyar dike. Mirov bi xweşik axaftinê ve dide fêmkirin, riyên baş û xirab destnîşan dike û riyên guherîn, veguherîn û pêşxistina jiyane vedike. Gotinên mezinan hene; mirov dikare bi gotinekê gelek tiştan xirab bike û gelek tiştan jî, baş bike. Li ser vî esasî, xweşaxaftin pîvanek xurt a çand û civakî dixwaze. Di nav civakê de gelek gotinên wekî:

“Gelek ziman şîrîn e.”

“Li ser gotinên xweşik ez hatim ser xwe.”

“Dijmin şîrîn, dost dijwar dibêje.”

“Mirov, bi zimanê xweş mar ji kûnê derdixe.”

Ev gotin di jiyana rojane ya civakê de jî, tên bikaranîn. Xweşaxaftin û bikaranîna gotinan, civakê ji her alî ve tîne ser xwe. Hêza jiyane zêde dike. Lihevkirina endamên civakê li hev tîne û riya şaristaniyê destnîşan dike. Şaristanî, jixwe li ser gotinên xweşik hatiye saz kirin. Gotinên xweşik riya evîndariya mirovahiyê, xwezayê û Gerdûnê vedike. Evîna pîroz, riya rastîn, xeml û rengê jiyane, di gotina xweşik de, veşartî ye. Ji ber vê yekê ji dirokê heta niha, mirov ji ber gotinekê hev dikujin, ango sax dikin. Li gorî mîtolojiyê jî, ewil kuştina mirov li ser dûjinekê, hatiye destpêkirin.

1-Dîksiyon Bingeha Xwe Ji Kû Digre?

Ziman, alavek (aracek) parastin û hevkarîya komên civakê yê destpêkê ye, ku xwe li hemberî şert û mercên xwezayê yê giran dida parastin. Her wiha di destpêka civakbûnê û vir ve, wek aracek hev û din fêmkirin û alîkarkirinê ye. Di dema xwe de, hemû zindiyên di nava xwezayê de, di nav têkoşîna man û nemana jiyane de bûn. Zindî, bi awayeke xwezayî bi ajoyên (gudu) hundirîn ve xwe diparastin û dijiyan. Mirovahiyê, bi xurtkirina raman afirandêrî pêş xistiye û bûye xwediyê hebûnek birûmet a alavên xwe

parastinê. Her wiha bi van alavan ve, desthilatdariya xwe li ser xwezayê bi pêş xistiye. Mirov, di destpêkê de, çiqas bi ajoyên hundirîn ve tevgeriya be jî, bi tevî pêşketina kedê û aqil, bi xurtbûna hestan her ku diçû hîsên hişyariyê pêş dikevin û vê yekê rê li ber hişyarbûna bîr û ramanên mirovan vedikir. Bi tevî pêşketina kapasîteya bîr û raman, di mirovan de têgihîştina xwe rêxistinkirinê bi pêş dixê.

Xwe rêxistinkirina mirovan, tê maneya destpêka civakbûna mirovahiyê. Civakbûn bi xwe re wateyek binirx a mirovatîyê bi pêş dixê. Pey vê rewşê, ziman û hizir jî pêl dide. Bi tevî hêza ziman û bandora wê ya li ser hestan, potansiyela hizirê jî xurt kir û bingehê saz kir. Ev pêşketina ziman, hizir û kedê, rê li ber civakbûnê vedike. Ziman di warê hev fêmkirin û rêxistinkirinê de, rolek gelek mezin dileyize. Dengên ku bi kîte û heceyan hatibû destpêkirin, rê li ber nirxê herî pîroz ziman vekir. Her wiha ziman bû nirxek manewî yê jiyane ku bingeha çandê saz kir.

Qlan, qebîle û eşiran, li hemberî zor û zehmetiyên xwezayê, xwe bi rêxistin dikin. Di rewşek wiha de, hêza fizikî, hêza xwe libergirtin, nêçîrvanî û şer, wek sedemek hebûn û tunebûnê dide pêş. Di rewşek wiha de, komên civakê bixwazin nexwazin, ji neçariyê di nav wekheviyekê de dijîn. Sedemên bikaranîna hêza fizikî rê vekir ku desthilatdariya mên pêş bikeve.

Di encama serdariya hêza fizikî ya mêr de, serdestiya rêvebiriyê jî dixê destê xwe. Jin, wek hebûnek mulk, di malê de tê dortengkirin. Vê rewşê, di warê pêşketina potansiyela jinê de, rolek xirab leyist. Piştî parvekirina kar û xebatê ya nêçîrvanî, şivantî, çandinî û zeneatkariyê ya di navbera jin û mêr de, bi xwe re Malê Zêde pêş xist. Vê yekê rê li ber hesûdiyê, çavbirçibûnê, dizî û gotinên xirab vekir. Civak, êdî li hemberî hev û din, bi uslûbek xirab, bi çavek xeter û gotinên derveyî ehlaq, hev û din hembêz dikirin. Mirovan, di jiyana rojane de, li gorî kar û xebata ku komên civakê di navê de ne, şêkil digirt. Xwe birêxistinkirina komên civakê yê wê wek qlan, qebile, eşîr û hwd. bikaranîna teknolojiya kevna re ya ragihandinê wek: borozan, dawul, cureyên muzîkan, malzemeyên ayinan û zengilan ve hatin destpêkirin. Di destpêka mirovahiyê ya serdema dayiksalariyê de, nobedar li deverên stratejîk dihatin bicîkirin, li hemberî êrişên cenewiran û derdorên xeter, bikaranîna borozan û zengilan ve wek; şaxên ga, çiquleyên pezkûvî, çermê darê û hwd. hev û din hişyar dikirin, xwe birêxistin dikirin û diparastin.

Her wiha di dema împaratoriyan koledariyê de jî, bi avakirina bircên belek ên li ser zirveyan, civak bi hin alavên hov ên ragihandinê ve dihatin agahdarkirin û tedbirên pêwîst digirtin. An jî bi riyên sefir û elçîyan, peyam ji hev û din re dişandin û

pêwendiyên diplomatîk saz dikirin. Ji aliyekê din ve jî, di dema împaratorên feodalîzmê de jî, heman rêbazên ragihandinê û pêwendiyê pêk dihatin. Her wiha di heman demê de, her qralekê destyek katiban hebûn. Ji bo kar û xebatên ragihandin û pêwendiyên diplomatîk van katiban her tişt dinivisandin. Sefîr jî bi awayeke taybet dihatin perwerdekirin. Di warê xwendin û nivisandinê de xwediyê astek herî pêşketî bûn. Di warê xweşaxaftinê (dîksiyon), ziman şîrîniyê, dîplomasiyê û bandorkirinê de, xwediyê hêza herî mezin bûn. Qraliyetan hîne di zarokatiyê de, ew perwerde dikirin. Ji aliyê uslûb, xwendin, xîtabetê û hemû aliyên din ên jiyane ve wek nûnerên xwe qebûl dikirin. Her çiqas ew perwerdeya ji bo katib û sefiran dihatin pêkanîn, mirov dikare wek bîngeha xweşaxaftinê ango dîksiyonê, bi nav bike. Hîne di wê demê de, rêbazek gelek derveyî ehlaq bû ku, hêzekî sefirê hêzekî din bikuşt. Çiqas xwendarî, di navbera hêzan de hebe jî, li dijî sefirên hev û din birêz bûn. Dema sefirek dihat kuştin her tişt diqediya.

2-Di Rastiya Kurdistan'ê de Bikaranîna Deng

Mezopotamya-Kurdistan, yekem xak e ku şaristanî lê pêş ketiye. Yekem car çand û ziman li vir bi pêş dikeve. Di çanda gelên Mezopotamya-

Kurdistan'ê de weke folklor, muzîk, kevneşopî û adet û teqalîdan, ev rastî tê dîtin. Hêza gotinê, di stran, merasîmên olî, taziyan û şahiyên de, serweriya xwe nîşan daye.

Ev rastî, di dengbêjiya gelên herêmê de, tê dîtin. Taybet di çanda Kurdan de, dengbêjî weke rojên destpêka şaristaniyê, zindîbûna xwe diparêze. Rastiya şanoyê jî, ji dengbêjiya Gelên Mezopotamya derketiye. Wek tê zanîn, dengbêjî bingeha xwe ji şaristaniyên Sûmer, Gotî, Qasît, Mitanî û Medan digre. Her wiha ev şaristanî bi hêza çanda Asur, Babil û Akadan, di dema xwe de, serkêşiya şaristaniyê dike. Şaristaniya Mezopotamya, bi çanda xwe ya dewlemend a kevn ve, pêşengiya şaristaniyên Anatolê, Misir û Hindistanê jî, dike. Tesîra gotinên Şaristaniya Mezopotamya, bandorek mezin li ser çanda Yewnana jî dike. Zanyar, filezof û hunermendên Yewnani, di bin bandora çanda Mezopotamya de ne. Şanoya Antîk a Yewnan, bi bandora çanda Mezopotamya bi pêş dikeve. Tê gotin, listikvanê yekem ê Tragedyayê Thespîs di bin bandora Dengbêjiya Kurdan de, dest bi xebata şanoyê kiriye û derketiye pêşberî Koroya Dhthnambosê. Her wiha bi rêbaza dengbêjiyê hunera xwe ya şanoyê pêşkêş kiriye. Di warê gotin, xîtabet û pêşkêşvaniyê de dişibin hev û din. Di dengbêjiya Kurdan de jî, mîtoloji, destan, bûyerên dirokî û jin heye.

Heman tişt, di şanoya Yewnanan de jî tê dîtin. Di dengbêjiyê de, bi hunera bikaranîna deng, sedem û trajediya bûyeran, kul û azar, xweşî û xemgînî û eşq û evînî tê destnîşankirin. Ji aliyê dîmen ve kesayeteke ku monolog dike, lê di dengbêjiya Kurdan de, dialogek tund heye. Ev rastiya mijara gotinê Homaros destnîşan dike. Her çiqas, Thespîs bi koroyê re derbikeve ser dikê jî, bi awayê monolog distre. Her wiha di şanoya Antîk-Yewnan de, bi tevî xîtabetek bibandor, gotin, muzîk, dans, figur û bizava rû jî, baş tê pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê, listikvan neçar in pir aliyên xwe xurt bikin. Yanî listikvanek pêwîst ba, diviyabû him senarîst, him helbestvan û him bestekar be. Dema mirov mêze dike dengbêj jî wisa ne. Dema bûyerekê tînin zimên, tenê stranên nabêjin, mijara evîndarî, şer, qehremanî, destanan, bi gotin, muzîk, xîtabet, helbest, bizava rû nîşan didin, dijîn û didin jiyandin.

Mirov nikare şano û hunera xweşaxaftinê, bi dengbêjiyê ve bi sinor bike. Her wiha taziyan Kurdan, listikên gundan ên qêdîm, di şano û listikvaniyê de, ciyek dirokî digirin. Lê ev hebûna dirokî ya mijara gotinê, ku heta îro berdewam dike, ne binivîskî, lê wek parçeyek çanda gel heta îro berdewam dike. Di hin demsalan de, merasîmên pîrozbahiyên tînan çêkirin, di van merasîman de, kostûmek xwezayî, dialogek hunerî ya dengbêjan, him

mirovan dixê nava xemgîniyê, him dide kenandin, him jî dixê nav xemgîniyê, him dide fikirandin him jî dixê nav dilşahiye. Ev listikên otantik ên Kurdan û Asuriyan in. Weke Listikên bi navê “Bûka Baranê”, “Kose Gelî”, “Beran Berdane”, “Xidir Nebî” û hwd. her wiha serpêhatiyên dirokî ku ji aliyê dengbêjan ve tînin ziman wek destana “Memê Alan”, “Mem û Zîn”, “Xecê û Siyabend”, “Bineşanarîne û Cembelî”, “Derwêşê Evdî û Edulê”, “Destana Gilgamêş”, “Şahmaran” û hwd. dewlemendî û kûrahiya çanda gelên Mezopotamya destnîşan dikin.

1-Dengbêjî: Di nava civaka Kurdan de yê herî baş dengê xwe bi kar tinin dengbêj in. Bêyî ku agahdar û xwende be, xwedî diksiyonek herî xurt e. Dengbêj dikarin hemû dengên herî baş bi kar binin. Hunera bikaranîna deng, diyafram û xweşaxaftinê, mirov dikare di dengbêjan de bibîne. Eger mafê gelên Kurdistanê heta niha nehatiba talankirin, niha rewşa çand, huner û wêjeyê wê gelek cuda ba û gavên gelek mezin wê bihatina avêtin. Dengbêjên Kurd di mektep, akademî û medreseyan de jî nexwendine. Lê hunera xwe gelek baş bi kar tinin. Hunera Şakîro ya dengbêjiyê, bikaranîna deng a Kawîs Axa, Meryamxan, Eyşe Şan, Mihemed Arifê Cizîrî, Hesên Zîrek, Şakîro, Karpêtê Xaço, Mihemed Şêxo, Şivan Perwer û hwd. di asta herî bilind a bikaranîna deng de ne. Wê demê ev pîrs dikeve

serê mirovan; eger ev dengbêjên Kurd, hunermendên welatek serdest bana, dibe ku weke Mozart, Bethofen bihatana dîtin?

2-Çirokbêj: Di Kurdistanê de, çandek ku ji destpêka şaristaniyê heta îro berdewam dike, çirokbêjî ye. Çirokbêjî, bingehe mîtoloji, dirok, serpêhatiyên rastîn ên civak û qehremaniya gelên me destnîşan dike. Çirokbêj di dema gotin û bilêvkirina hunera xwe de, mirovan dibin kûrahiyên dirokê. Bi hest, mejî, bizava destan û vehûnandina gotinan, bandorek gelek mezin li ser civakê dikin. Mirovan dibin nava şeran, bajar bi bajar digerin, xeyal û fantaziya mirovan berfireh dikin. Hîn serpêhatî û çirok hebûna xwe gotinî çend roj û şevan berdewam dikirin. Van dengbêjan rola şanoyê jî girtin li ser milê xwe. Bi hunera bikaranîna xweşaxaftinê bandorek li ser her kesî kirine û bala her kesî kişandiye.

3-Şivanî: Civaka Kurd, civakek gundî ye. Gundvanî jî bi şivantiyê tê destpêkirin. Di nava civakê de yê herî xwediyê diksiyonek baş şivan in. Şivan her çiqas ne di wê zanebûnê de bin jî, jî ber xwezaya ku ew di navê de ne, dengê xwe baş bi kar tinin. Di demê ku mirov mêzeyî rastiya şivanan dikin û erdnîgariya Kurdistanê digre berçavan, bikaranîna hunera deng a şivanan, wê baştir bê têgihîştin. Her wiha li Kurdistanê her şivanek xwediyê hunerek muzîkê ye. Yanî

dengbêj e, yanî filûtê lê dixê ango defê. Qêrîn û hewara wî ya di nav xwezayê de, bi awayekî xwezayî dengê wî tê perwerdekirin. Di her listikek şanoyên Kurdan ên kevn de, mirov dikare şivanekê bibîne. Di her stran, serpêhatî û çirokekê de deng û rengê şivan tê xuyakirin. Ev rastiya ku gelên Mezopotamya–Kurdistan’ê di nav de ne, rastiya sazkirina destpêkê ya afirandina şaristaniyê ye.

4-Lorînên Dayikan: Ahengên olî, tazî, reşbelek û şahiyên de, bikaranîna dengê jina Kurd, gelek balkêş e. Di dengê jina Kurd de, dirokek gelek kûr û veşartî heye. Kul û êşên ku gelên Mezopotamya kişandine di dengê jina Kurd de tê xuyakirin. Di heman demê de ka çawa jina Kurd dengê xwe bi kar tîne, di dersên zankoyan de wek perwerde tê nîşandan. Her wiha heman deng, lorîn û dengê ku di şîniyan de bi kar tinin di sînemaya hemdem de jî, rolek gelek mezin dileyize. Bi taybet di sinemayên Tirk, Faris û hin welatên Ewropî de, weke melodyek trajîk dengê jina Kurd tê bikaranîn. Taybet di bûyerên trajîk, karesat û taziyan de, wek fonêk taybet tê bikaranîn. Heta di salên 2000’î de jî, ji bilî bikaranîna dengê awaza jina Kurd, navên filmên sînemayî jî weke Zerda, Bêrivan, Berfîn, Zînê, Xecê, Şîrîn, Star û hwd. bi nav dikin. Her wiha bandora çanda şanogeriya ya Mezopotamya gelek bibandor e. Xwediyê reseniyek (orijînaliteyek) xurt

a dirokî ye.

5-Çandini: Civaka Kurdistan-Mezopotamya, ji destpêka şaristaniyê bigre heta niha, jiyana xwe bi çandiniyê, zenetkariyê û bazirganiyê ve derbas dike. Civakek afirandêr e. Bi taybet bi axê re heşir û neşir e. Xwediyê zimanek gelek dewlemend e. Zimanê li herêman tê bikaranîn bingehê xwe ji çandiniyê digre. Her wiha ziman, vehunandina gotinan, bikaranîna deng û bingeha xweşaxaftinê, ji afirandêriya civakê ya çandiniyê tê. Bandora herî mezin a dewlemendiya çandê ji pêwendiyên baş ên gelên Asur, Kurd, Faris, Ereb, Ermen, Cihû û hwd. tê. Ev gel bi hezaran sal in bi hev re dijîn. Didin, distînin. Zimanên hev û din tê digihên. Çandek hevpar a dewlemend heye. Ziman jî li gorî vê rastiya çandiniyê dewlemend e. Her wiha ev dewlemendî mirov dikare di govend, muzîk û reqasê de bibîne. Bi taybetî di Folklorê Kurdî û Asuriyan de ev yek baş tê dîtîn. Di her figûrek folklorê Kurdî de bûyereke destnîşan dike ku hîne nehatiye kifşkirin. Di her bizavek folklorê de eger lêkolîn were kirin, bûyereke dirokî wê bê dîtîn.

6-Zaneatkari: Dewlemendiya çanda civakan bi afirandêriyê ve tê pîvan. Bi taybetî bingehê dirokî ya zaneatkariya li Mezopotamya, bi xwe re dewlemendiya ziman jî pêş xistiye. Çawa ku çandiniyê Kurdan, Mimariyê Asuriyan pêş xistiye; zaneatkari jî, ji

aliyê Ermenî'yan ve, hatiye pêş xistin. Lê, ev civak hemû bi hev re bi hezaran salan jiyana kirine. Piyek girîng ku ziman dewlemend kiriye, zanetkarî ye. Lê, hemû afirandêriyên li Rojhilata Navîn bi awayekî xwezayî pêş ketine. Dewlemendiya ziman, çand û hunera civakên li Kurdistan û Mezopotamya'yê ji vê rastiye tên.

3-Di Akademiyên Perwerdê de Dersên Hunera Xweşaxaftinê

Şaristaniya Yewnanistan'ê di encama bandora çanda Mezopotamya û Misirê de pêş ketiye. Di Cihanê de welatê herî zû, baş û girîngiya hêza gotinê keşif kiriye Yewnanistan e. Gotin li vî welatî wek hebûnekî herî pîroz a felsefîk, civakî, siyasî, çandî û hunerî hatiye pejirandin. Hêza xweşaxaftinê, di serdema pêşketina sîte û demokrasiyê de pêş dikeve. Li Atîna'yê, ji tiyatroya Dionisos bigre, heta ciyê Meclisa Hemwelatiyan Pniqs'ê hêza gotinê desthilatdar bû. Hemû eserên wêjeyî, çandî û civakî di encama hêza xîtabetê de hatine afirandin.

Yanî herçiqas mirov ne di wê zanebûnê de bin jî, girîngiya xweşaxaftina baş xwe dida pêş ku pişt re di akademiyên zanistî yê perwerde yê Sokrates de weke "xweşik axaftinê" hatiye binavkirin. Belgeya herî baş ya di der barê xweşaxaftinê de, esera xwendekarê Sokrat (B.Z.469-399)-

Arîstoteles "Retorîka" (B.Z. 384-422) de tê ditin. Retorîk tê maneya "Hunera Xîtabetê." Taybet retorîk riya çareserkirina problemên pratîk û siyasetê vedike. Li gorî felsefeya Arîsto, xweşaxaftin bi cewhera însan a çandî, sosyalî û dirokî ve girêdayî ye. Yanî eger mirov ji aliyê rûhî ve xwe pêş nexistibe, wê nekaribe gotinên xweşik bi lêv bike. Esera Retorîk, taybet di akademiyên zanistî û perwerdê de hatiye sazîkirin. Her wiha di danûstindina mirovan de riya gotûbêjê vedike. Taybet ji bo ku zewqê însan ji bo gotûbêjê were zêdekirin, rêbazek dîalektîk e. Di rêbaza retorîkê de riya serkeftinê bi rêbazên dîalektîk ve destnîşan dike. Di pirtûka retorîkê de, formula têgihîştina xweşaxaftinê hatiye danîn. Di dema ku mirov mêzeyî Retorîkê dike, dibîne ku ev eser di encama pêwîstiyek mezin a Akademiyên de pêk hatiye. Her wiha di heman eserê de tê destnîşankirin ku, siyaset bi Hunera Xîtabetê ve tê qezenckirin. Her wiha tê îddiakirin ku, felsefeya senteza arîstokrasiya cihanê ji aliyê Arîstoteles ve hatiye danîn. Her wiha li gorî Lange (Geschichte des Materialismus) 'Arîstoteles ew Fîlezofo e ku, her tim bûye alîgirê siyaseta arîstokrasiyê'. Yanî tebeqeya arîstokrasiyê bingeha xwe ji Arîsto digre.

Li hemberî pêşketina dîalektîk a li Yewnan'ê siyaseta dewletê wenda dike. Dîalektîka Arîstoteles ji aliyê

Akademiyên Stoa ve, (Sazumankarê akademiya Stoa, Zenonê Qibrîsî ye- B.Z. 334-262) wek "Mantiq" qebûl dikin. Yanî Retorîk û Dîalektîk dibe bigeha zanistiyê. Retorîk, xweşaxaftina ji bo derve, dîalektîk jî, wek axaftina hundirîn qebûl dikin. Her wiha li ser bingeha psikolojiya mirovan êdî teoriyek zanistî pêş dixin. Ev Hunera Xîtabetê êdî ne tenê di warê siyasetê de, di xebatên çand û hunerê de jî, wek têgihîştinek felsefî tê qebûl kirin.

4-Di hunera şanoyê de girîngiya dîksiyonê:

Têgihîştina hunera xweşaxaftinê ya Felsefeya Arîsto êdî tesîrek mezin li ser çand û hunerê jî dike. Hunera tiyatroyê ya nivîskî pey Arîsto, di serdema xwedayê Şarabê Dionysus de hat destpêkirin. Ciyên ku ev huner pêşketî ye, yek Yewnanistan e ya din jî Hindistan e.

Cara yekem B.Z di sedsala 4'an de li Akropolisê, di serdema Xwedayê Dionysus de hat saz kirin.

Yekem ciyê şanoyê (B.Z 350) ku 14 hezar kes bi cî bibin, ji aliyê Genc Polyditos ve li Epidourûs'ê hat avakirin. Hunera şanoyê ji destpêkê bi çêkirina maskeyan û komên biçûk ên koro û pêşkêşvanekê ve hat destpêkirin. Destpêk zindîkirina Mîtolojiyê bû. Xweda û beşer, erd û asîman, zayîn û mirin û hwd. sahne û meskeyên Şanoyê, rûniştin û

pêşkêşkirina klasîk (yanî duz) esas tê girtin. Yanî tesîra şanoyê ya rûbirûkirinê û direkt temaşekirin pişt re tê fêmkirin. Pey vê rewşê şiklê anfi wek çandekê xwe ferz dike. Di vê sahneya mijara gotinê de yekem festîvala çandî hatiye çêkirin. Di vê festîvalê de kesayetên navdar, qehreman, mirin û saxî û hwd. hatibû zindîkirin. Pey sedsala 5. B.Z ji terzê pêşkêşkirina klasîk derbasî sererastkirina peryodê dibin. Yanî sîstema anfi tê saz kirin ku, heta ji bo roja îroyîn jî derbas dibe. Ên vî karê hunerî dikirin jî, taybet ew rewşenbîr û hunermend bûn ku, di akademiyan filezofan de xwendibûn. Bi tevî Şano, koroyên muzîkê, aktor rolên sereke dileyiztin. Ji bo festîvalan, êdî di serî de hunera maske, xweşaxaftin, kostûm, rola sereke ya huner dileyiztin. Di heman serdemê de nivîskarên dramên wek: Aeschylus, Sophocles, Euripides û Aristophanes pêş dikevin. Di berhemên xwe de taybet mirin, zayîn, qehremani û xweda hatine destnîşankirin. Hunera nivîsa şano, bi tevî ya xweşaxaftinê û pêkanina listikvanan, êdî festîvalên saz kirin. Di rewşek bi vî rengî de êdî pêwîstiyek gelek mezin ji bo xweşaxaftinê tê dîtin. Di akademiyan heman serdemê de, êdî dersên xweşaxaftinan tên dayîn. Hunera Şanoyê di serdema B:Z sedsala 4'an de navend li Atîna, belavî welatên din ên Ewropa'yê dibe.

Şano, di destpêkê de, bi armanca pêkanîna daxwazên xwe yên ajoya hundirîn û ya din jî cîhana derve ye ku hêza wî ya fêmkirinê têr nake tê destpêkirin. Ji ber vê yekê di eserên heman demê de mirin, zayîn, xwedaxwedê, erd û asîman heye. Şanogerên heman demê tevgera mirovan a baş û xerab, bi huner hunandiye û hest û mejiyê mirovan pêş xistiye. Bi pêşxistina aqil, ziman hatiye xurtkirin, hemû bizava di nava xwezayê de bi hunera şano hatiye hunandin. Zor û zehmetiyên mirovan ên li hemberî xwezayê bi huner û zimanê şanoyê, bi civakê daye fêmkirin. Pêwendîya însan a bi xwezayê weke şerê li hemberî heywanan, pêwendîya mirov û daristanan, deng û rengê zindiyan, li hemberî zehmetiyên xwezayê wek kerasat, tufan û hwd. zimanê xwe parastinê pêş xistiye û bi hunera şanoyê radesti dest, çav, guh û aqilê mirovan hatiyekirin. Şanogeran serkeftina xwe ya aqil, bi listikên şanoyê diyarî civakê kirine. Pêş ketina şanoyê mezinahî pêş ketiye. Civak di warê ziman bigre heta kostûm, bizava pêwîst a destan, çavan xistiye nav zindîbûnê. Şanoyê mirovê ku baş dileyize û diaxife afirandiye. Bi leyiztina Şanoyê mirovan xwe nas kiriye. Kêmasiyên xwe dîtine û zimanê rastiyê fer bûne. Şano, hînê ji destpêkê ve xwediyê hin taybetiyên bingehîn ên pêşxistina mirovan bû:

a- Cewhera xwezayeta kesayet:

Şano, ne tenê coş û heyecan, aqil û mantiqê, hest û hişyariyê jî di kesayet de mezin dike. Ji bo guhertina cihanê çawa huner pêwîstiyek e ku vê dimeşîne ji cewherê kesayet ê pîrûpak e. Bi kinayî, “xirakirina lêgerînên xerab ên kesayet e’.

b- Cewhera gerdûnî ya du jiyanan (Cewhera dualî):

Di listikên aktoran de, kesayet jiyana xwe dibîne û ders jê derdixe. Her wiha riya herî baş a kûrkirina ziman, aqil û seferberkirina bizavê ye.

c- Cewhera Dîrokî:

Di nav jiyana rojane de, cewhera dîrokê tê destnîşankirin. Dema borî tê destnîşankirin, pêwîstiyên paşerojê radixîne berçavê civakê. Li ser esasê jiyana derbasbûyî paşerojek baş a jiyana mirovan tê lêkolînkirin. Xerabî tên rexnekirin û perspektîfa paşerojê tê danîn. Li ser rastiya însan, temaşevan hizirkirinê û biryardayîna jiyane pêş dixê.

d- Cewhera gerdûnî, di kesayet û civakê de diafirîne û pêş dixê:

Hebûna mirovan û rastiya wan ku aliyên neyên guhertin lêkolîn dike. Têkiliyek gerdûnî bi riya huner diyarî cemawer dike.

Aliyê statîk, kûrbûn û lihevkerina rastîn pêş dixê. Civakên ji hev dûr û hev nas nakin, bi zimanek gerdûnî bi hev re dide naskirin.

Hêza Hunera Şanoyê gelek berfireh

e. Berê weke tayek nivîsê dihat qebûlkin. Pey re derket holê ku hunera şano gelek dewlemend e. Hêza xwe ya bingehîn: Ji dîmen, muzik, nivîs, sînema, mîmarî, grafik û dansê digre. Her wiha dewlemendiya xwe ji zanyariya civakê, zanyariya rûh, dîrok, felsefe û ziman digre. Xemlandina wê jî, bi zanebûn û fantazyê, dekor, ronahî, kostûm û aktor û hwd. ji bo ku baş were fêmkirin jî: Ahengek yekbûnê, kirpandina pêwîst, mêzînsazî û balkêşiyê digre. Şano bê tekst jî dibe. Bî afirandêriya hizrê û çalakiya ziman, mirov dikare pêk bîne.

Di rastiya şanoyê de gotinên xweşaxaftinê, canê mirov zindî dike, bi gotinê dîmen destnîşan dike û hizrê dixê nava çalakiyê. Di şanoyê de ne nivîs, gotin hebûnek bingehîn e. Lê hemû jî parekên şanoyê ne. Nivîs afirandêriyek kesayet e. Lê gotin afirandêriyek lihevkirina kolektîf e. Deng û xemla di sahneya şanoyê de wek: Muzik, deng, ronahî, dekor, kostûm, teknîsyen, aktor û hwd. neçar in di nav ahengek yekgirtî de bimeşin.

Destpêka şanoyê mirov dikare bi vî rengî binirxîne. Lê çiqas hunera şanoyê pêş ket û tesîra wê mezin bû, bala desthilatdaran jî kişand. Her wiha di her çaxê de hunera şano, ziman û aktoran tên guhertin.

Li gorî rêvebirê Şanoyê Îngilîz Peter Brook: “Şano tê maneya her tim şoreşê.”

Pedegok û zanyarê çandê yê

Awistiryayî Richaerd Meister zanyariyek rûh a sistematîk e. Zanyariyek taybet a çand û ziman e.

Lê ev şoreş û zanyarî her tim rastî êrişên desthilatdaran hatine. Lê Pêşgirtina hunera Şanoyê, ji destpêkê de ji aliyê desthilatdaran ve pêk hatiye.

Wek mînak împaratoriya Roma (B.Z. 354), girîngiya şano û tesîra wê ya li ser civakê fêmkirî û li gorî daxwaza xwe hunermendan, rewşenbîran bi darê zorê bi rêxistin dike. Yanî edî şano ne wek hunerek perwerdekirina civakê, dibe hunera çê û dilşahiya qralên împaratorên Roma. Di merasîmên arenayan de bi tevî muzîkê, şerkirina gladyatoran, dans û pêşbirkên leşkerî, festîval tên çêkirin. Li gorî felsefeya Roma, ji bo ku civak ser hîlnede, pêwîst e festîval werin çêkirin û nan were belavkirin. Yanî li gorî felsefeya Roma, eger mirov birçî bimînin wê ser hildin. Pêwîst e di nav civakê de nan kêr nebe û her sal jî 100 roj cejn werin amadekirin. Di van cejnên de axaftinên siyasî ku mezinahiya Roma destnîşan dike, tên kirin. Taybet xîtabeta siyasî herî pir di vî serdemê de pêş dikeve.

Di dema împaratoriya Roma'yê de nivîskarên şano wek: Plautus, Terence û Seneca hatine naskirin. Sahneyên Şanoyê qasî 30 metre bûn ku, heta roja îroyîn derbas dibin.

Di Şanoya Roma'yê de du mijarên bingehîn hebûn:

a: Di komediyê de muzik

b: Di trajediyê de jî koro bi kar aniye.

Heman çanda şanoyê ji Ewropa bigre heta Asya û Efrîqa'yê berfireh dibe. Lê bi tevî pêşketina xiristiyaniyê, rewşek nû tê destpêkirin. Dewleta Roma, di encama êrişên qebileyên Germen'an de dema paşketinê dest pê dike. Di cihanê de împaratoriya herî mezin 'Roma' tê zanîn. Ji her aliyê ve gelek împaratoriyeke mezin bû. Di warê nîzama leşkerî û siyasetê de, bingeh ji nîzama îroyîn a cihanê re daniye. Dema bahsa siyasetê tê kirin, hemû kes mîzeyî diroka Roma dike. Ji rojhilat ve felsefeya xiristîyanî ji rojava û bakûr ve jî êrişên barbaran, hilweşîna vî împaratoriya mezin pêk anîn. Împaratoriya mezin a Roma, di serdema P.Z 450 tê rûxandin. Pey rûxandina împaratora mezin a Roma'yê, heta salên P.Z 1200'an valahiyeke gelek mezin pey xwe dihêle. Mirovahî li Ewropa, Asya û Efrîqa'yê di nav rewşek gelek xerab de, sedsalên xwe derbas dikin. Lê di dewsa sîstema Roma'yê de, xiristîyanî wek felsefeya jiyane ya rizgariyê cî digre. Di warê propagandeyê de rolek gelek mezin dileyize. Taybet li paytexta Împaratoriya Roma, Roma'yê wek navendekê ji xwe re hildibijêrin. Di dewsa sîstema Roma'yê de, desthilatdariya dêrê cî digre. Di sedsala P.Z 1200 de ji nû ve ronakgerî dest pê dike. Aktor, rahîp, hunera Latîni diafirînin. Êdî şano li gorî

parçeyên Încîlê tê çêkirin. Di hemû listikan de propaganda Încîlê tê kirin. Hunermendên şanoyê yan bi geryana di nava gel de, yan jî li herêmên xwecih, hunera xwe pêşkêş dikirin. Her wiha di vî serdema mijara gotinê de jî, li Bakûrê Franse Valenciennes (P.Z 1547) ciyek taybet a Şanoyê hatiye saz kirin. Ev sahneya ku hatiye saz kirin, wek sahneya herî baş a şanoyê tê qebûl kirin. Ji ber ku cara yekem bi dekorek gelek xurt ve hatiye xemilandin. Di sahneyê de ciyê jidayikbûna Îsa cennet, cehnem û bi giştî dekor bi motifên xiristiyaniyê ve dihat xemilandin. Di berhemên şanoyan de cihan û jiyana sosyolojîk a mirovan radixîne berçavan. Di van huneran de hemû rengên jiyana mirovan tî xuyakirin. Cara yekem bi rêbazên kevnare duman di sahneyên şanoyê de tê derxistin. Agir tê vexistin, zindîbûnek nû di hunera şanoyê de tê pêşxistin. Di şanoyên demê de 32 parçeyên Încîlê bi huner re dikin yek. Di şanoyan de qehremaniya şehîdên xiristiyaniyê tî pêşkêş kirin. Di heman demê de mijarên perwerdeya ehlaqî û moralê jî tî pêşkêş kirin. Pey desthilatdariya Roma, xiristiyaniyê di destpêkê de nerm û baş tevgeriya. Lê her ku diçe desthilatdariya xiristiyaniyê jî xwe li ser huner û hunermendan ferz kir. Li hemberî daxwazên hunermendan, rewşenbîran bi helwestên negatîf tevgeriyan. Wan jî gelek tişt li gorî xwe qedexe kirin û

xwestin bixin bin kontrola xwe. Lê bi tevî pêşketina bazara di navbera bazaran de (P.Z sedsala 16 û 17'yan) êdî di navbera sistema dêran û ronakgeran de nakokî her ku diçe kûr dibe. Resim dihatin qedexekirin, nêrîn û têgihîştina azad nedihat qebûlkirin. Di bin maskeya olî de êdî her dewletekê rastiya xwe li ser ronakgeran ferz dikir. Hest û mejiyê însan çiqas pêş diket, cîhana wan jî ewqas mezin dibû û dixwestin li gorî cîhana xwe ya bêsînor tev bigerin û hunera şano û muzîqê pêş bixin.

Bi tevî komên şanoyan komên muzîkê jî, êdî di nava bajarên bazirganiyê de ketin nav liv û tevgerê. Dêrdorên gundan çanda gundvaniyê (wek muzîk, helbest, listik, kinc, stran û hwd.) dianîn bajaran. Çanda bajaran jî tesîrek mezin li ser wan dikir. Ji bilî vê yekê zanyarên dêran muzîka ku ji bo Kadetral'an taybet bestekirî bûn, di bajaran de pêşkêş dikirin. Di rewşek wiha de, êdî hunermendên bajaran, listikvanên şanoyan û tebeqeya navîn di nav rewşek azad de, hunera xwe pêşkêş dikirin. Çi şano be, çi jî komên muzîkê bin, êdî bêyî sistema desthilatdar hunera xwe diyarî gel dikirin.

Bajarên Îtalya hunermendên şano û muzîkê, cara yekem şahiyên ku ji komên gel re vekirî bûn, amade kirin. Di van şahiyên de, axaftin dihatin kirin û muzîk didan guhdarkirinê. Pişt re van hunermendan Operaya Grand saz kirin.

Xwendekarên Gerok: Hin xwendekaran jî şahiyên helbest, şano, muzîkan amade dikirin. Her wiha bajar bi bajar digeriyan û hunera xwe pêşkêş dikirin. Lê ev komên xwendekaran her tim rastî êrişên dêran û sistemên dewletan dihatin.

Ji bilî van komên muzîkê, komên bi navê Jester ku di sarayan de stran digotin pêş ketibûn. Muzîka derveyî dêran hat pêşxistin. Ev yek jî aliyê dêran û sarayên dewletê ve wek hunera bêehlaqî û xerabiyê hat nixandî û êriş birin ser. Ev yek helwestek siyasî ya dêran û sistemên desthilatdar bû.

Papa John di serdema 1325'an de, di merasîmeke di der barê huner û hunermendan de wiha dibêje:

“Di dewsa gotinên xweşik ên muzîka pîroz a berê de, akademiyan nû yên şano û muzîkê, ku bi darê zorê awazên nû, tempoyek melodiya bilez, li ser gotinên pîroz gotinên derveyî olî ku zêde kirine, îbadet tê çewtkirin, guh tê jahrkirin, çav tîn korkirin, guhdarvanan ber bi riyên xerab û derveyî ehlaq ve dibe hatine vekirin.”

Bi vê helwesta dêran ve diyar e ku, êrişek gelek mezin li ser hunermendan hebû. Taybet di serdema sedsala 16 û 17'an de. Lê tevî zordestiya desthilatdaran, nekarîbûne pêşiya pêşketina şano û muzîkê bigrin. Di wê demê de dadgeh dihatin çêkirin û bi

hezaran mirov dihatin cezakirin. Hunera Opera wek îlahiyan di dêran de hatin gotin. Opera di destpêkê de tenê deng bû. Pişt re muzîk ji li ser hat zêdekirin.

Li Almanya Martîn Luter (P.Z 1525) gelek îlahî nivîsandine. Di warê pêşvexistina zimanê Alman de rolek dirokî leyiztiye. Her wiha helbestên wî di îşyanên li hemberî desthlatdaran de, wek stranên serhildanê digotin. Her wiha Martîn Luter, ji bo ku zordestiya li ser huner û hunermendan rabike, têkoşinek biaqil pêş xistiye. Bûye pira lihevkirina di navbera dêran û pêşketina ronakgeriyê de.

Li Îtalya Oraziyo Vecchî (1550-1605)

Li Îngilistanê John Dowland (1562-1626)

Tohomas Morlay (1557-1603) hemû hêza xwe ya ronakgeriyê (helbest, beste, xebata ziman, listik û hwd.) ji derveyî dêran meşand. Ev ronakgerên mijara gotinê bingehek nû ya çandî pêş xist ku dibe bingehek ji bo operayê.

Opera wek muzîka serdemiyê tê qebûlkirin. Opera ew dram e ku, hatiye bestekirin. Her wiha di sedsala 16'yan de li Floransa Venêdik'ê helbest wek stran di saray û dêran de tîn gotin.

Di heman salan de tenê li Venêdik'ê 6 opera tîn vekirin. Opera di hemû sarayên Ewropa'yê de weke çandek pêşketî tê qebûlkirin û eleqedarî tê nişandan. Opera, weke hunerek sarayê pêş ket. Lê ji ber ku desteka gel ji bo

opera hebû, bi rexnekirina xetayên demên borî, sîstemên îro rexne dikirin. Di heman sedsalê de bajarên Îtalya bûn wargeha helbestvan, dengbêj, nivîskar, listikvan û ronakgeriyê. Dibistanên herî pêşketî yên xweşaxaftinê jî di heman demê de hatibûn vekirin. Ev dibistan û akademî ji aliye wan ronakgeran ve hatibûn vekirin ku, berê hatibûn çewisandin. Opera bi deng û rengê xwe, bû xeyala kozmopolît a civakê. Şano û hunera opera bi gotin, kostûm, dekor û awazên xwe çiroka qehremanên civakê û serpêhatiyên binemalên qêdîm dianîn rojevê.

Opera herî birêkûpêk P.Z di sala 1598'an de ji aliyê Jacopî Perî ve li Floreca'yê hat sazkirin. Kompozîsyonek baş a bi navê Defne nivîsand. Pey vê xebata Perî eleqedariya ji bo opera hîn berztir bû. Cara yekem li Floreca'yê (1600) konseyek ronakgeran a bi navê Camerata ku hunermend, dramnivîs, helbestvan, nivîskar tê de cî digirtin, hatibû sazkirin. Vê koma ronakgeran taybet mîtolojiya Grekan lêkolîn dikirin û berhemên xwe heta demekê li ser vî esasî saz dikirin. Cameratan çandek nû ya solistiyê û hunerek azad pêş xist.

Claudio Monteverdî ku (P.Z 1607) xeta Perî domand, sazumankar û bestevanê yekem ê operaya modern e. Di warê zindîkirina huner û listikvanên li ser sahnayê de, xwediyê rolek mezin e. Di muzîkê de, kompozîsyonek hemdem û awazek xurt pêş xist. Heta wê demê

tenê opera di dêran de ji bo merasîman dihat bikaranîn. Propaganda ola xiristiyaniyê dikiir. Tiyatroya herî pêşketî li Îtalya Mantova'yê hat pêşxistin. Êdî Opera bi dans, koro, gelek cureyên enstrûmantan û dekorên dewlemend ve hat dewlemendkirin. Montoverdî di sala 1642'an de opera dawî ya bi navê *L'Incoronazione of Poppaea* (Taca Poppaea) ku jiyana Neron û evîndara wî Pappaea destnîşan dike dinivîse. Ev eser heta roja îroyîn jî bandora xwe didomîne.

Ji salên P.Z 1637 û 1700'an opera li her deverên Ewropa wek çandekê pêş dikeve. Hema hema li hemû paytextên welatên Ewropa, opere tîn sazkin. Di diroka operayê de ya ku pir di warê dengxweşiyê de binavûdeng e û tesîr li ser civakê kiriye Pietro Antonio Cesti ye. Di warê diksiyon û bikaranîna deng de, hostayek gelek mezin e. Taybet di berhema wî ya bi navê (*The Golden Apple* 1667) *Sêva Bihuştê* de, hostayiyek mezin pêk aniye. Di hemû zanîngehên Ewropa'yê de bikaranîna dengê wî iro jî, mijara gotûbêjê ye.

Li Îngilistan'ê jî (P.Z 1634-1650) di heman salan de, çanda opera pêl dide. Xatîb, hunermend û ronakgerên wek Matthew Locke, Henry Cooke, Charles Coleman û George Hudson pêş dikevin.

Di heman salan de li Ewropa Operaya Komîk tê pêşxistin. Êdî di bin navê komediyê de, desthilatdar tîn rexnekirin. Şêwaza operayê bi şîba şanoyê, weke dialog beranberî hev û din

tê pêşkêşkin. Di van listikan de him civak, him jî desthilatdarî tê rexnekirin. Pirsgirêkên rojane yê di nava civakê de rû didin, bi şêwaza rexnegiriyê tîn pêşkêşkin. Operaya Komîk wek saziyeke komediyê ku di navbera civak û desthilatdaran de rola sererastkirinê bileyize tev digere. Di dema xwe de gelek bala civakê dikşand.

Li Îngilistan'ê: Operaya John Gayin *Ballad*

Li Îtalya: *Dell Kommedya*

Li Almanya: *Singspil Opera* hatin sazkin.

Taybet di van operayan de listikên popûler ên civakê dihatin leyiztin. Di van operayan de civakê xwe û desthilatdar nas kirin. Heta di warê ronansa Franse'yê de rolek gelek mezin a hişyariya civakê leyizt. Di listikên van operayan de ronakgeriyek mezin pêş xist. Çawa ku mirov didan kenandin, her wiha perwerdeyek mezin a sosyolojîk jî pêk dianîn. Him ji bo mezinan, him jî ji bo zarokan dibistanek mezin bû. Nivîskarê komediyayê bi navê Moliere (1663) ku ramana wî bûye rêbaza klasîzmê, di esera xwe ya bi navê "*Versay Tuluati*" de wiha dibêje: "Armanca komedya ew e ku, bi uslûp û zimanek xweş kêmasiyên mirovan eşkere bike, taybet kêmasiyên çaxa heman demê."

Hunera şano û muzîka opera, li gorî her çaxê tê guhertin. Li gorî pêşketina civakê şekil digre. Him şeklek nû digre him jî, gel perwerde dike.